

Kurd Li Sûriyê Nejadperestiyek Çewsandineke Bêhtir Zêdetir,

Cotyar Murad

Di 5ê meha Çiriya Pêşîn de, çil û heft sal bi ser serjimêriya awarte derbas bû ku li Parêzgeha Hîsiçe ku piraniya wê Kurd in, hat encamdan, bi bihaneya naskirina Kurdên Sûriyê ji yê ne Sûriyê, ew serjimêriya çepel li gor biryara hijmar /93/ ya 23'ê Tebaxa 1962'an de hat cîbicîkirin û di mada yekê de hatiye: "Pêwîst e di yek rojê de serjimêriyê gîştî ji bo xelkên parêzgeha Hîsiçe bihê cîbicîkirin û dema wê jî bi pêşniyazê Wezîrê Karên Hundir û bi biryara Wezîrê Pilandanînê bihê diyarkirin" û wek hatibû danîn, ew serjimêriya ku jêdera xwe ji lojîk û hizrekî şovînisît distîne, di 5'ê Çiriya Pêşîn a 1962'an de cîbicî kirin, û li gor statîstîkan, regeznameya bi dehan hezar Kurd bê tu sedemekê ji wan hat standin, ji bilî ku ew Kurd in, û di encama serjimêriyê de gelê Kurd li Sûriya li ser sê beşan hat

parçekirin: 1- Kurdên xwedan regeznameya Sûriyê. 2- Kurdên ku regeznameya wan ji wan hat standin, û di qeydên fermî de bi navê "biyanyên Hîsiçe" hatin nivîsandin, û karteke sor a venasînî dan wan û nikarin paseport der bixin yan ji sînorê Sûriyê derkevin, û ne tenê ev, heta nikarin di otêlan de jî binivin, tevî ku piştî xwendina xwe di peymangeh û zanîngehan de tamam bikin, nikarin di karên hikûmetî de bibin karmend. 3- Kurdên ku regezname wan ji wan hat standin, lê di qeydên fermî de bi yekcarî nehatine tomakirin, û ew jî bi "mektom" tên naskirin, û hebûna wan bi karteke zer tê cudakirin, û tu dukomênt yan belgeyên fermî bi wan re tune, ji bilî bawername venasînê ku ji ba muxtar derdikeve yan senedê rûniştinê, ev kes jî ji hemû mafên welatîbûne bêpar in û nikarin xwendina xwe di zanîngeh û peymangehan de berdewam bikin yan bawername

bekeloriya bistînin.

Ji wê demê ve, û di encama wê pirojeya nejadperest de, ew beşê gelê Kurd (kesên regezname ji wan hat standin û kesên veşartî ku hejmara wan niha ji 300 hezar kesî zêdetir e) ji hemû curên cudakirinê dinalin û ji hemû mafên siyasî, aborî, civakî û rewşenbîrî û herwiha ji mafê çavdêriya tendirustî, ku hinek nexweşxaneyên leşkerî û hukumî pêşwaziya wan nakin mîna (nexweşxaneya leşkerî ya Tişrîn, nexweşxaneya Esed), ev hemû ji xaynî ku nabe bibin xwediyê zeviyên çandinê yan xaniyan.

Herwiha ji hemû mafên welatîbûnê jî bêpar bûne, û ji bo wan tune ye hevjin û zarokên xwe li ser navên xwe tomar bikin. Piştî ku Partiya Bees desthilat li Sûriyê girte destê xwe û rewşa awarte di 8ê Adara 1963an ragihand ku heta niha berdewam e, li cihê ku bandor û encamên serjimêriya awarte rast bike, bi armanca jinavbirin û tunekirina gelê Kurd li Sûriyê, hikûmeta Bees siyasî û karên hikûmetên berê berdewam kirin, bi rêya sipartina Mihemed Teleb Hîlal (ku di wê demê de berpîrsê ewlekariya siyasî bû li deverê) ji bo amadekirina dîrasedekê tevahî li ser parêzgeha Hîsiçe, bi merema zanîna rê û awa û çawaniya jinavbirina hebûna Kurdan li deverê û windakirina wî di nav netewa Erebi de Belê Mihemed Teleb Hîlal ev yek bi cih anî û nixandineke berfireh li ser parêzgeha Hîsiçe pêşkêş kir û têda Kurd bi gelekî bê şaristanyet, ziman û bê dîrok pesn kir û têda got jî, Kurd tenê xwedan tundûtûjî û hovîtiyê ne û ev jî rûniştvanên çiya ji yê din cuda dike, ew nixandina Hîlal ji 12 pêşniyaran pêk hatibû û têda awayê jinavbirin û tunekirin hebûna Kurdan li deverê şirove kiribû, bi rêya: 1- Koçkirina hundir (bi rêya veguhastina rûniştvanan re). 2- Belavkirina nezanîn û têngihîştinê,

D.R. (7)